SÎNOR

Diyarbekir warê min e cihê bab û kalê min e

Luqman Asîhî

Hîviya min ew bû, rojekê çavê min bi şûrha Diyarbekirê bikeve. Rast e min nedîtibû lê her tiştê wî bajarî di serê min de gelek mezin û hêja bû. Bi xwe dîsan Diyarbekir hêja ye lê qeda li zemanî bikeve. Beriya heyamekê bi behaneya nesaxiyê min serek li (enqereyê) xist, di vegerê de, ez du roj û du şevan li (paytexta) Kurdistanê Diyarbekirê mam. Ya ji min hatî min kir. Ez bi xelkê re axivîm, min tişt ji dukandaran kirîn, çûme olîcamiyê û min hindek ji wê şûrhê jî dî. Lê heyfa min û wê yekê ku yên bi zimanê kurmancan diaxivtin pir û pir hindik bûn û zimanê tirkan li wê derê bûbû rêçika wan a danûstandin û kirîn û firotin û silav û xatirxwestin. Tenê min du jin dîtin ku bi dengekê bilind bi zimanê kurmancan diaxivtin û ez ji we venaşêrim ku wan herdu jinan jî pars dikir û ji berku xelkî zû bi zû dirav nedikirine di destê wan de, wan jî bi wî dengê bilind û bi kurmancî xeber û qeseyên rût û çivêl li her derî di weşandin weka din di cergê welatê kurdan de, zimanê kurdan hindek maye bi min re.

Ev çîroka rast, hevalekî min yê Zaxoyî ku beriya heyamekê çûbû tirkî ji min re digot.

Bi şev careka din, min hizra xwe di gotinên wî destebirakê xwe yê Zaxoyî de kir: Dema em du sê xûngerim li cem hevdu rûdinin gotina yekê em dibêjin: Jimareya kurdan niho ji 40 milyonî derbazbûye, lê em ji bîran dikin ku Diyarbekirî êdî nema bi kurdî diaxivin, eger na, pa çima tenê ji wan hemû milyonên kurdan li (tirkî) tenê bîst perlemantarekên kurd ketine di (meclîsa) tirkan de?! Erê ma ev yek, wê çendê diyar nake ku ji bilî ji bîrkirina zimanî, kurmancên wê derê, hêj tiştên din jî ji bîran kirine?

Hevalê min got: Du sê dukandarekan eynî pirsyarê ji min dikir, digotin: Erê rast e hûn kurd însanên dîndar eziyet didin? Yekî din di otêlê ve, gote min, erê rast e hûn kurd petrola xwe didine gawiran?! Gotî, min gotê, ê birako hê me petrol nîne da em bidine gawiran ya muminan!

Ez evê çîrokê zêdetir dirêj nakim, lê tenê dibêjim Diyarbekir hê ew Diyarbekireye a ku Şêxê Pîran lê hatiye daleqandin lê yên weka wî Şêxî qey hê ne hatine yan jî dê bibêjim, de bila qeda li dîrokê bikeve û qeda li îro jî bikeve.